

Cejna Qurbanê jî di

navbera Îran û Erebiştanê

de hevrikî bû

»»» R:7



Navenda Havkarî: Niha jî

Kurdiştan çepera berxwe-

daniyê a Îranê ye

»»» R:4



ناوەندی هاوکاری حیزبه گانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasaî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (356) 22-08-2019 Buha (1000) Tûmen

Komara Îslamî di xizme-

ta Îsra'îlê de ye

»»» R:2



Girûgeh teji bû ji Kurd

û komonîştan

»»» R:5



Fermana 28'ê Gelawêjê nekarî

Kurdan tune bike

»»» R:8



Alava me şiyana partiya me ye

Roja pêncşemiyê 24ê Gelawêja 1398'an a Rojî, rêûresmek ji bo bîranîna salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê li binkeya sereke a PDKÎ bi beşdariya endamên rêberî, kadr û pêşmergeyên vê partiyê birêve çû.

Rêûresm bi marşa netewî a Ey Reqîb deşt pê kir. Pişt re beşdarbûyên rêwresmê ji bo rêzgirtin ji gyanê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdiştanê xulekekê bêdeng sekinîn.

Pişt re birêz Hesên Şerefî cîgirê yekem ê lêpirsyarê giştî ê PDKÎ peyama vê partiyê bi helkefta salvegera avakirina vê pêşkêş kir.

Wî pîrozbahî li xelkê Kurdiştanê kir û got ku xelkê Kurdiştanê, PDKÎ weke partiyeke azadîxwaz binav dikin û di heyama 74 salên derbasbûyî de, PDKÎ riyeke pir dirêj di xebatê de derbas kiriye. Gelek serkeftin bi deşt xwe ve anîne ku di gupîtka wan de jî avakirina Komara Kurdiştanê ye. Gelek dijwarî dîtine û eş kişandine. Xebatkarên wê ketine girtîgehên. Dayîk û bavên girtiyan ji ber darvekirina zarokên wan, eşê dikşînin.



Gelek endamên vê partiyê aware bûn û xebatkarên vê hemû eş û elem dîtine. Lê ciyê şanaziyê ye ku ti yek ji wan eş û elem û dijwariyan nekarîne berên zarokên Kurdan ji xweştêkên wan ên netewî û demokratîk bizivîne.

Derbarê qonaxa nû a xebata PDKÎ li Kurdiştana Rojhilat jî got ku niha jî alav û amora me, bi bandorbûna partiya me ne. Bi heman armancê jî sê salan beriya niha Rasan hate ragihandin. Ew armanc, heman bi bandorbûn e. Armanca me ji Rasanê, giştgirkirina xebatê ye ji bo ku piraniya xelkê Kurdiştanê, vê tevgerê weke tevgera xwe bibînin û têde beşdar bibin. Vê tevgerê jî aliyên cuda hene û divê di hemû aliyan de gav bêne avêtin.

Got jî ku niha givaşên ser rejîma Tehranê pir zêde û rûxêner in û bi vî qasî jî hêviyên me weke Kurd û PDKÎ bi pêşerojê geştir dibin. Rewşa niha ji bo Kurdan û bi teyabet ji bo Kurdên Rojhilat, pir heştyar e. Rejîm di hemû waran de di bin givaşê de ye, divê PDKÎ careke din hûrbîni û kûrbîniya xwe a hertimî bi kar bîne da ku hemû derfetan weke xwe û metirsiyan jî weke xwe bibînin.

Pişt re peyama komîteya hevahengiya Saziyên Demokratîk ên Kurdiştana Îranê ji aliyê Selam Îsmailpûr endamê desteya rêveber a Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdiştana Îranê ve hate pêşkêşkirin. Wî di peyamê de got ku gelek taybetmendiyên PDKÎ hene ku pêgeha civakî a wê di asta hemû Kurdiştanê de berfireh kirine. Herwisa vê partiyê di kûrahiya dilê xelkê kurdiştanê de cihê xwe vekiriye.

Amaje jî kir ku rêbaza Demokrat, weke wan hewlan tê binavkirin ku divê mirovên Kurd li ser bingeha nîrxên weke demokrasî, rizgariya netewî, çareseriya dadperwerî a pirsê pêkhatayan, sêkolarîzm û wekheviya regezî bêne perwerdekirin. Herwisa di riya rêkxistinê de şoreşgêr de xebata xwe di wan

waran de bêne armançkirin û kanalîzekirin.

Di kevana rêwresmê de hin sirûd û pexşanên taybet jî hatin pêşkêşkirin.

Hevdem xebatkarên Demokrat li bajar û gundên Kurdiştanê li hemû navçeyên Zagrosê bi encamdana çalakiyên teblîxî, nîşan dan ku sêrka Gelawêjê qet li wan wenda nabe û her roj geştir dibe. Herwisa bi çalakiyên wan derket holê ku piştî 74 salan, hîn ew mekteba ku Pêşwayê Kurdan ava kiriye, li ser piyan e û zarokên vê nîştimanê ji bo cangorîtiyê, di rêbazê de ne û qehremaniyê diafrînin.

Pêşmergeyên Bajar û xebatkarên çepera şerefê li bajarên Sine, Şino, Seqiz, Kirmaşan, Pîranşar, Kamêran, Dêwlan, Îlam, Dereşar, Merîwan, Awdanan, Endîmişk, Bane, Bokan, Ormiye, Mehabad, Miyandoaw, Sayinqela, Bûşêhr, Tehran û li gund û bajarokên vê nîştimanê, agirê Gelawêjê ve kirin û bi tirakt û postêrên taybet bi vê helkeftê, Kurdiştan xemilandin û xewa xweş ji çavên dagirkar şandin.

Sergotar

N: Kerîm Perwîzî

Basa dezgehên ajantiyê bo nav dezgehên welatên din, baseke kevn û dûr û dirêj e, û ji serdema şerê kevn ê imperatoriyan ve, ew cureya xwe xuşikandina dezgehên ajantiyê bo nav dezgehên welatên din hebûye, ku hêza welatekî ji riya ajanên xwe ve, xwe xîstiyê nava hêzeke din de, û deriyê piştê ji bo hêzên xwe vekirine, û imperatoriyeke rastî şikestê kiriye.

Di serdema nû de, rêkar û şewaza nifûz û xwe xuşikandina ajantiyê zêdetir bûye û di serdemê de ku bawerî sist dibin û berjewendiyên takekesî jî cihê wan digrin, îmkana van cureya xwe xuşikandina di nava dem û dezgehên ajantiyê de jî zêde û zêdetir dibin.

Di sîstema kolonyalîstî a Komara Îslamî de, destpêkê hatina li ser deshilatê ya vê rejîmê bi sedema îdeolojîk-bûna vê rejîmê radeya bawerîya pasdar û besîciyan bi vê deshilatê zêdetir bûye, û di êrişê li dijî Kurdiştanê de, gellek caran ew bûyer hatine dîtin, ku besîciyên Qum û Îsfahanê digotin ku em hatine “şehadet”ê, û Xomêynî jî kilîda buheştê daye me.

Lê niha êdî tu baweriyêke îdeolojî û ayînî bi vê rejîmê nemane, û ew qas talan û tawan kirine, û ew qas gendelî kirine, ku tu pasdarek jî baweriyê bi wan nake, belku tenê berjewendiya takekesî wan li dewra rejîmê radigre. Di demê de ku îdeolojiya Wilayeta Feqîh rastî şikest û têkçûyîna hatiye, û gotinên rejîmê jî, tu bawerdarek li dewrê nemaye, û pasdarên rejîmê tenê berjewendiya aborî wan li dewra rejîmê radigre, û ew berjewendiya aborî dikare di cihê din de bê berfirehkirin.

Her ew nifûztêkirina ye ku dibe sedema xwezelandina dezgeha zanyariyan ya welatekî din di nava dezge-

Komara Îslamî di xizmeta Îsraîlê de



hên Îtîlaatî ên rejîmê de, û ji vê riyê ve heya bilindtirîn aşt ji Wezaretê Îtîlaatê û Îtîlaata Spaha Pasdaran dibin xûreka nifûza ajantiyê û mohreyên xwe difroşne rejîmê!

Dema ku di civîneke cihanî de serokwezîrê Îsraîlê belgeyên pirojeya navkî ya rejîma Tehranê eşkere dike, û dibêje bi hezaran belge ji Tehranê ve veguhaştine bo Îsraîlê, ew yek nîşan dide ku dezgeha zanyariyan ya Îsraîlê çiqas kariye xwe bizelîne nava jorên heştîyar ên rejîma Wilayeta Feqîh de.

Her di van rojan de, ji zimanê berpîrsên rejîmê bixwe ve bo mînak kesekî wek Ebdullah Şehbazî ku rawêjkarê beyta Xamineyî ye, dibêjin ku berpîrsekî payebilind ê Îtîlaata rejîmê reviyaye û çûye Îsraîlê.

Ew basa xwe zelandina dezgeha zanyariyan ya welatên din di nava dezgehên ajantiyê û Îtîlaatî ên rejîmê de, baeke ku renge bi dehan û sedan kesên din tê de hebin ku yan bi bername yan jî bê bername li cihê din ya vê rejîmê de cih girtibin, yan jî di pêvajoya bêbawerîya wan bi rejîmê de dest kiribin bi firotina zanyariyan, lê rejîm dixwaze ku ji mijarên weha mifahê wergre, û ew dosiyeyên pîr ji tawanbarî ku hene, girê bidin bi van cure kesan ve.

Bo mînak Elî Muteherî cihgirê meclisa rejîmê dibêje ku dosiyeya qetlên zincîreyî û kuştina zanayên etomî û teqîna li Meşhedê dîsan dibe bêne zindîkirin, yanî diwaze ku ew gumana çê be, ku ku ew cureya dosiyeyên kuştar û teroran, ên rejîmê bixwe nebûne, û Welîyê Feqîh pak e, û eva kesên ser bi dezgehên zanyariyan a welatên din in ku ew kar kirine.

Di vir de du xalên girîng dibin cihê pîrsê:

Yekem-Hekî dezgeha zanyariyan ya welatekî din ew qas kariye xwe bizelîne nava dezgehên Îtîlaata rejîma Îranê de, ku heta siyaseta stratejîk jî bo rejîmê dadrêjin, û dosiyeyên weha mezin li ser ava dîkin ku bi qasî sî salan rejîmê mijûl dîkin, gelo bes ew dezgeh, wan bo çî ava kiriye, ma wan bo Îsraîlê dezgeha Îtîlaatê ava kirine?!!

Duyem- xwe hemû tawan û komkujî her bi tenê çend mînakên biçûk nînin, ger weha be, ku tawan di vî welatî de kesên ser bi dezgehên zanyariyê ên welatên bîhanî kiribin, û biryar dabîn, di vê demê de bes Xomêynî û Xamineyî û Refsencanî û Xelxalî û Bihiştî û hemû ayetullahên rejîmê her bi tenê duholek bûne di destên bîhaniyan de!

Ew dosiyeya ketina dezgeha zanyariyan ya welatekî din di nava Wezaretê Îtîlaatê û Îtîlaata Spaha Pasdaran û cihên din du tiştên girîng dibêje: yekem, tawan beşeke bîngêhîn e ji pênaseya vê rejîmê, lewra her kes heta bi qewlê wan bixwe, “nifûzî” jî be, ku tawanan encam bide, ne tenê her em jê biguman nabin, belku gellek hezkirîtir dibe. Duyem, sîstema Komara Îslamî di biyavê îdeolojîk de rastî têkçûnê hatiye, û hemû mohreyên wê amade ne ku xwe bifroşin.

Mîstefa Hicrî: PDKÎ, ji xelkê pêk hatiye û partiya xelkê ye



Mîstefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi helkefta salvegera avakirina PDKÎ peyamek belav kir.

Peyam wiha ye:

Peyama Mîstefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi helkefta 25'ê Gelawêjê salvegera avakirina vê partiyê peyamek belav kir.

Gelawêj, xala geşbûna hêviyan pîroz be û hêviyên we bilidn bin.

74 salan beriya niha Hizba Demokrat a Kurdistanê, ne bi helkeft lê belê bi pêwîstiyê siyasî û bi pêşîneyêke dîrokî li ser deştê nemir Qazî Mihemed hate avakirin. Ew qonax, weke serdema hevrikiya hizra Nazîsm, faşîzm û sermayedariyê tê binavkirin û vê hevrikiyê, hemû navçe lixwe girtibû.

Berjewendiyên cîhanî, navçeyî û ji aliyekî din ve serdeştiya rejîmeke weke Pehlewî, bêparî û mafxwaziya neteweyan û yek ji wan neteweya Kurd li rojhilat, zêdetir pêwîstiya dîrokî û siyasî a avakirina vê partiyê ji me re zelal dike. Ew partî, berdewamiya rêbaza tevgerên berî xwe bû û li ser bingeha teşkilatî a Komeley Jiyanewey Kurd ji dayîk bû. Helbet aştengî û rewşên tevgerên berî wê, ji hev cuda bûn. Her yek ji wan, pêşîneyêke dîrokî a taybet û pêşerojêke cuda li pêşîya xwe hebû. Lê bi giştî, hatina Hizba Demokrat a Kurdistanê, weke xaleke nû di dîroka tevgera siyasî a Kurdistanê de tê binavkirin.

Vê partiyê li gor pêwîstiya dîrokî û erk û berpirsi-

yaretîyan, nûneratiya xebateke dijwar hilda. Nûneratiya neteweyêke bindest, xwedîderketina gotara Kurdîniyê, hewldan ji bo wekheviya civakê, azadî û rizgariya netewî û vegeyriyana kerametê û ji bo neteweyêke mafxwarî û perçekirî di vê beşa niştîman de hêlên serêke ên vê xebatê bûn ku heya niha jî berdewam in.

Nebûna azadiyê, nebûna derfetan, hewla piştguhxiştin û jinavbirina dîrok û nasnameya Kurdan ji aliyê deştîlata dijî mirovan a navendî ve, bûye sedema xebateke dirêj ku bi hezaran şoreşgêran li xwe digire û qonaxên cuda û gelek aştengî derbas kirine û li pêşeroja serkeftinê nêzîk dibe.

PDKÎ ji xelkê pêk hatiye û ji bo vî xelkî ve. Netewewazî û diyarîkirina çarenivîsa netweya vê partiyê, rêbaza sereke a vê ye. Demokrasî û nirxên wê, moral û pîrensîpa hertimî a PDKÎ ye. Bihevrejîyana dilxwazane, hevxebatî û hevaltiya neteweyên bindest û aliyên azadîxwaz, bingejên sereke ên xebata vê partiyê ne.

PDKÎ piştî avakirina Komara Kurdistanê weke morkeke netewî û semyaneke mezin a siyasî û dîrokî, bi gotar û kiriyara xwe nîşan da ku li ser soza xwe a xwestek û nirxên netewî dimîne. Deştkefên Komarê, vegeyriyana zimanê dayîkê, perwerdeya niştîmanî û çanda netewî, deştînişankirina ala û marşa netewî, pêkanîna hêza pêşmerge, heman navûnîşan in ku weke rihên kiyaneke netewî tene binavkirin û lewma jî PDKÎ û dîroka wê, şanaziyê bi van deştkeftan dikin.

Gotara sala 19 û deştpeka sedsala 20an, deştpeka qonaxa hişyariya netewî û geşekirina hizra rizgarîxwazî û pîrepêdana serhildan û tevgerên niştîmanî bû lê dîsa jî hatina PDKÎ xonaxêke nû li pey xwe ve anî.

Organîze û xwedîsazîbûna

Komara Kurdistanê, danîna bernameya modern, siyaseta aşîtxwaziyê, girîngîdan bi nirxên mirovî û paraştina mafên kêmnîyên netewî, ziman û ol, dabînkirin û paraştina ewlehiya navçeyê, girîngîdan bi ciwanan û jinan, girîngîdan bi warên perwerde, ragihandin, çape-menî û hin mijarên din, di dîroka zêrîn a Komara Kurdistanê de zîndî mane û nîşan didin ku PDKÎ û rêberatiya wê hewl dane vê bûyerê pêk bînin. Tevahiya wan bûyeran jî, ji şewazên xebata berî wan cuda bûn. Piştî vê cudahiye bi nîfşa nûxwazî û birojkirina xebatê, danîna rûpeleke nû û geş ji bo pêşerojê bûn.

Perwerdeya xelkê bi hizrên netewî ji bo deştînişankirina mafên çarenivîsa xwe, naveroka xebata PDKÎ ne. Ev naverok jî, ji gotara Kurdîniyê û nasnameyê xuya dibe. Em di vê baweriyê de ne ku bername û hêlên siyasî û PDKÎ li ser heman gotarê hatina danîn. Raştiya van gotinan jî bi dîrok û qonaxên cuda ên xebata PDKÎ xuya dibe. Pîrsa netewî, hertim pîrsa PDKÎ û neteweya Kurd li rojhilat e. Di aştêke giştîtir de jî ew pîrs, pîrsa çaresernekirî a tevahiya neteweyê bindest li Îranê ye. Rijdbûn li ser pîrsa netewî jî nîşan dide ku Kurdistan bi awayekî sîstematîk hatiye kolinîkirin. Xebata di hemberî wê de ji bo rizgariyê û derbasbûn ber bi qonaxa azadiyê, pêşerojêke geş dide ber çavên me.

Dabînkirin û misogerkirina mafên netewî, li gor hemû pîvanîna siyasî, îdarî, aborî, çandî û civakî, nerîna giştî a PDKÎ ye ku ew jî tenê vî û xwestekên netewî ên Kurdan li rojhilat in.

Em li ser naveroka vî mafî rijd in. Qeware û forma vê mijarê jî dimîne ser rewş û faktên navxwe û derve. Li gor me, niha sîstemeke demokratîk û federal ji bo dabînkirina azadî û bextewerî û demokrasî û mafên neteweyê û pêkhatiyên cuda ên vê jeografîyê, pêwîst e.

Ji bo vê armancê jî yasayeke demokratîk û modern pêwîst e ku bikare hevkeşeya piştguhxiştin ji aliyê navendê ve jinav bibe û kerameta neteweyên bindest bide wan û mafê deştînişankirina çarenivîsê jî dabên bike. PDKÎ û kiriyara şoreşgêrî

Ji deştpeka avabûna PDKÎ ve heya niha, ji vê demê ve ku xebatkaran vê partiyê di gurtîgehê de ne, di bin sêdareyê û reşkujiyê de ne, di koçberî û awareyiyê de bûn heya serhildanê, di serhildana mezin a salên 46 heya 47an de, di qonaxên xebata çiya û berxwedana bajar de, di dema xebata li kolanan de û bi xebata sivîl û girevgerî, kiriyara şoreşgêrî, berxwedan, lêbûrîn û cangorîtiya kadr, pêşmerge, endam û alîgirî li bajar û çiya bûye mîrata partiya me. Van taybetmendiyên jî partiya me kiriyê partiyêke netewî, û xelkî a pêkhatiyên rojhilatê Kurdistanê. Heman partiya ku li hemberî du rejîmên dijî mirovan û xwînrij derketiye.

Di jiyana siyasî û qonaxên dijwar de, partiya me tenê demekê jî dev ji xebatê beredaye. Hemû dîrên dîroka partiya me ji demsalên zêrîn ên xebatê pêk hatine û her rok jî gavên xurttir davêje. Newroza sala 1395an bi ragihandina Rasana Rojhilat, qonaxêke nû a xebatê deştpekir û em ber bi ezmûneke nû û dîtingeheke nû ve diçin.

Rabûna vê carê, di guhertinên navçe, Îran û Rojhilatê Kurdistanê de cihê xwe girt. Rojhilateke nû, amajeyêke din ji bo rewşa niha a rojhilat e. Lewma jî ev qonaxa nû a xebatê bi sloganê girêdana xebata bajar û çiya deştpekir. Nerîneke pîralî û giştgir e ku tekezê li ser parvekirina erk û berpirsiyariyên xebatê bi ser hemû pêkhatiyên civakê de dike. Ev jî, gotareke netewî û giştgir e ku cudahiyan li ser bingeha berjewendiyên hevpar li hev girê dide. Wat-

»»»»Dom R:3

eyê dide reftar û kiryarên me û hevçarenivîsî û hevxeberiyê bike hêzeke xurt, hevçarî û bi bandor.

Em hewl didin di Rasana Rojhilat de xebateke piralî û giştgir birêve bibin. Valahî nemîne û tevahiya derfet û

şiyanan ji bo xurtkirina Rojhilat bi kar bînin. Ji ber ku tenê hêz, dikare yekalîker be. Baweriyeke me a kûr bi tebayî, hebûna gotareke hevpar û zimanê hevpar heye. Zêdebarî vê jî, li gor me, nerînên bi rexne, nerînên vekirî û demokratîk in. Em pêşeroja Rojhilat û rewşa niha a xebatê jî bi heman nerînê dibînin.

Li gor me, divê rewşek li ser bingeha bawerî bi hêza xwe bê pêkanîn ku ew hêz û aliyên ku baweriya wan bi mafên netewî, azadî û pîrensîpên demokratîk heye, têde piroseyek ji xebata hevpar danîn. Hem di mijara navmala Kurd de û hem jî di asta Îranê de. Di vir de û bi vê helkeftê silavê didim giyanê

paqij ê tevahiya şehîdên rîya azadî û rizgariya Kurdistanê û bi teybet şehîdên rêber. Silavê didim malbatên rûsorên şehîdan, girtiyên siyasî û lehegên berxwedana navçalên reş de. Silav li vîna polayîn a pêşmergeyên Kurdistanê li bajar û çiya. Silav li xelkê xebatkar û azadîxwaz ê Kurdistanê.

Navenda Havkarî: Niha jî Kurdistan çepera berxwedaniyê a Îranê ye



ناوهندی هاوکاری حیزبهکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

Navenda Havkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê li salvegera fermana cîhad a Xomêynî a li dijî Kurdistanê peyamek belav kir.

Peyam wiha ye:

28`ê Gelawêjê salvegera 40 salî ya fermana cîhadî a Xomêynî û êrîş bo ser xelkê azadîxwaz ê Kurdistanê ye.

Civatên xelkê Kurdistanê!

Hevniştimaniyên xweragir û hezkirî ye Kurdistanê!

40 sal berî niha û di 28`ê Gelawêja sala 1358 a rojî de, Xomêynî rêberê nû ê komara Îslamî, piştî 9 meh hukimranî bi derkirina Fitwaya li dijî xelkê bêsûç ê Kurdistanê û azadîxwazan, bi awayên curbicur wekî dadgeheke sehayî a Xelxalî û biryara cezadan û îdama berpîrsên partiyan û kuştina xelkê asayî ên Kurdistanê û bi hêncetên bêbingeh, tohmet û boxtanên ne bicî, leşkerkişiyê berfireh li ser ax û xelkê Kurdistanê deşt pê kir.

Rejîmek ku di tarîtiya dîrokê de hatibû, û xevna xeyalî bo civaka Îranê hebû, da ku vê civakê bibe nav tarîtxaneyê sedsalên navîn, nedikarî Kurdistanê qebûl bike ku di wê heyama kurt de piştî serketina şoreşa gelên Îranê heya 28`ê Gelawêjê wate li

heyama kêmtir li yek salî de, tevî kêmezmûniyê jî, li birêvebirina welat û hukimraniyê de, Kurdistan bi aramî û tenahî bi rê ve dibir, û di wê heyama kurt de û tevî dorpêçên aborî ji aliyê deshîlata navendî ve Kurdistan bibû mînakê li deverên azad û demokratîk û wekî modeleke alternatîv bo hemû Îranê çav lê dikirin.

Nûnerên gund û bajarên wê, bi dengê azad yê xelkê hatibûne hilbijartin û encûmenên sinfî karên xwe bi rê ve dibirin, û dabînkirina mafê wekhevîyê bo jinan di deştûra civaka Kurdistanê de, ku ezmûna civakeke sêkolar derbas dikir, bibû çiqelê çavên hakimên Komara Îslamî de. Nigeraniya ji bihêztirbûna wê ezmûnê bibû handerê sereke yê Komara Îslamî bo leşkerkişî û êrîş bo ser xelk û axa Kurdistanê. Ji bîra me neçe ku her bi wî awayî dihete çavnihêrikirin ku, heta ew hêzên ku bi hêncetên pûç ên wekî xebat li dijî Amerîkayê ketin gel komara Îslamî û piştevanî jê kirin, û li dijî tevgera Kurdistanê deşt avêtne dujminatiyê, piştî raştî serkuta Komara Îslamî hatin, û bûne qurbanîyên xezeba deştêlata olî a kevneperest.

Lê dîsan jî, û tevî bihêziya pitir ji îmkanat û alavên leşkerî, lê em dikarin

bi serbilindî bêjin ku 28`ê Gelawêjê di wê demê de roja berevanî û îradeya neteweya Kurd bû bo xebat li dijî zêdexwazî û serkutê. Hemû çiya, dol, gund û bajarên Kurdistanê bûne çepera berevanî û berxwedanî û di wê rêyê de gelek şanaziyên mezin ji aliyê tev xebatkar û hêza pêşmerge ve tomar kirin. Niha û piştî derbasbûna 40 sal bi ser temenê Komara Îslamî a Îranê; Îran di rewşeke nearam de ye, û hakimiyet tev ketiye jêr givaşên yekcar zêde ên welatên Rojavayî û deverê, û ji aliyek din ve xelkê mafxwaz ê navxwe ên Îranê jî, û ji aliyek din ve heya tê, ew givaşane zêdetir dibin.

Ji aliyekê ve zêdexwaziyên deverê ên Îranê, û deştêwêrdana li nava karûbarên welatên cîran û cîhanê, û piştevanîkirina terorîzmê, pîrsgirêka navkî û mûşkên dîrhavêj ên wê ku bûne kirîzeke mezin û sedema dorpêçên aborî û pîrsgirêka derveyî, û ji aliyek din ve kêrnehatibûna siyasî, sîstema berfireh a rantxorî-mafyayî a aborî, serkuta nerînên cuda û pîrsgirêkên navxweyî ên di navbera baskên deştêlatê, û dehan sedemên din ên navxweyî, Îran gihîştandine wê rewşa niha. Nerazîbûnên van du salên derbasbûyî wê rastiye nîşan didin ku heya tê, xelkê Îranê li nûsaziyê li nav sîstema hakim bêhêvîtir dibin û roj li pey roj giranya jiyanê di nav ew demûdegezane de zêdetir dikeve ser milê xelkê, û pitir heşt bi bêçarenûsiyê dikin, lê hêviya heman xelkê bo berxwedanîkirin li hember hakimiyetê rû li bilindbûnê ye, û ji aliyekê din ve jî bo carek din heta bo pêşve diçin, û helqa dijberên wê

û dujminên derve yê Îranê berfirehtir dibe, û helqeya hevalên wê tengtir dibe.

Di encamê de tu deştêlata-darek nîne ku karibe heya dawiyê bi givaş, serkut û îdamkirinê jiyana xwe dom bike, û eva hêz û îradeya komên xelkê ye ku qedera her civakê diyarî dike. Bi xatircemî ve Komara Îslamî a Îranê jî, her di wê rêçika dîrokê de diçe, ku hemû rejîmeke dîktator û serkutar tê de çûne, û serketin bo wan kesane ye ku bêy tu dudîliyê li hemberî deştêlata-darên wiha disekin. Xûya ye piştî 40 sal xelkê Kurdistanê her bi hesta serdema şoreşa gelên Îranê, domê bi nafermaniya xwe li hember Komara Îslamî didin. Bi hemû ew guhertinên ku bi dirêjahiya wan salane di ser civaka Kurdistan û Îranê de hatiye, dehan car bi li ber çavê hemû aliyekî ve xelkê Kurdistan li hemberî wê rejîmê sekinîne, û nîşan dane ku niha jî Kurdistan her çepera berxwedaniya Îranê ye, û xelkê Kurdistanê jî şoreşvanên pêşveçûna wê rêyê ne.

Navenda Havkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê jî, yekdengtir ji her carê, û berçavrontir ji berê, bo yekgirtina zêdetir di navbera civak û hêzên siyasî de pêngavan davêje, û piştîgîrdayî bi piştevaniya berfireh a hemû xelkê Kurdistanê ye, û bo xelkê Kurdistan û Îranê, mîzêyê paşerojeke rûnahî dike.

Navenda Havkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê

28`ê Gelawêja 1398-an a Rojî

Girtîgeh tejî bû ji Kurd û komonîstan



N: Bûbê Eser

Gardiyan:

“Bi çûyin û hatina yuzbaşî, nava me germ bûbû, kêfa min li cih bû. Ji ber ku rêya xelasiyê dihat dîtin. Berî ku ez werim leşkeriyê, kesên leşkerî kiribûn digotin: “Li leşkeriyê nasekî meriv di nava serbazan de derkeve, wê demê kêf kêfa meriv e.” Loma kêfa min jî gelekî ji wî yuzbaşiyê re hatibû. Ma min ji ku dizanîbû ew kes sadîst e, ma min ji ku dizanîbû ew kes, kêş e, û min ji ku dizanîbû ew dijminê mirovên qenc e. Ma min ji ku dizanîbû, wê bobelatên mezin bîne serê min.

Mehek di ser ecemîtiya min de derbas bû bû. Ew meh li min bûbû weke çend salekê. Ji lêdanê mirov ber xwe nedidît. Heroj lêdan tada û zulmdarî hebû. Ji ber wê zulm û zordariyê meriv digot: “Bila mirov ji vir xilas be, çi dibe bila bibe”.

Rojekê dîsa em li talîmê bûn, ew yuzbaşî hat. Em hemû ên di rizê de bûn. Wî destê xwe xîstibû nav hev û danîbû ser qûna xwe, serê xwe bilind kiribû û li me mêze dikir. Wî ji nava me çend kes destnîşan kir. Ez jî yek ji wan bûm. Kêfa min hat ku ez jî hatibûm hilibjartin. Em ew kesên hatibûn destnîşankirin, me weha bawer dikirin ku ew ê me ji vê ecemîtiyê xelas bike û weha jî bû. Em ji ecemîtiyê hatibûn azadkirin. Lê berê me ber bi ku de bû, ne diyar bû. Dema em ji nava hevalên xwe derketin, Yuzbaşî got: -Bidin dû min! Me hemûya bi hev re got: -Emir bike komûtanê me.

Em li erebeyake servekirî kirin, çûne cihekî din yê leşkeriyê. Em birin metbexê, berê xwarin da me, xwarin gelekî xweş bû. Em weha tê gihîştin ku ev xwarin taybetî ji bona me hatibû çêkirin. Em şaş bû bûn, gelo çima ev kes weha dike? gelo ji bo çi em ji ecemîtiyê azad kirin û xwarina xweş dide me? Me xwarina xwe qedand. Piştî xwarin û vexwarinê wî pirsî:

-Çawa bû? we têr xwar û vexwar? ma hûn dixwazin her roj weha bixwin, vexwin û talîmê nekin? Me dîsa bi hev re got:

-Tu emir bike komûtanê me. Hêvî û daxwaza min hatibû cih. Ez difikirim ku ev kes ji min re bû weke bavekî. Ma min ê ji ku bizanîba, ev kes wê malikê li min xerab bike... Wê dema ku me tade û îşkence dikirin, em li xwe hay nedibûn. Lê niha, dema ez wan kiryanan difikirim, dîn û har dibim. Gelekî mixabin êdî tiştê nema ji destê min tê. Tu bala xwe bide vî halê min, êdî ez nikarim herim nava civatê. Dema li mirova mêze dikim ew kiryarên girtîgehê weke filmê sine-mayê têne ber çavên min û ji xwe fedî û şerm dikim”.

Sîdar xwest ji wî pirs bike, çima ew ketiye vê rewşê û got:

-Baş e, ez dixwazim fêr bibim; çima tu nikare here nava civatê, sebeb çi ye? Sebeb çi ye ku tu dixwazî tenê li vê çolê di nava vê darîstanê de bijî? Em bêjin tu ji civatê aciz e, lê çima tu naçe nava malbata xwe, li gel dê, bav, xuşk û brayên xwe najî?

“-Ez bêjim qurban, ez bêjim. Dema leşkeriya min qediya, ez ji mirovantiyê derketibûm. Bû bûm hov, bû bûm dewar, dîn û har bû bûm. Bû bûm weke seyekî har, min li kîderê mirovek bidîta hema min êrişî wî dikir. Ew kiryarên ku min li girtîgehê de dianî serê wan girtiyan, êdî di ruhiyeta min de, di serê min de hatibûn bi cihkirin. Ji bêyî wan tebata min



nedihat, min dikir û nedikir min nikarîbû, xwe ji wan serboriyan xilas bikim. Min êdî mala xwe jî weke girtîgehê dizanîbû. Loma car carna dema ku bavê min tiştê ne li gor min bikira, min ew weke ku wî şaşitiyek kiribe, jê re digot:

-Kurê min te ev şaş kir, heqê te 20 jop in. Ji ber şaşî û çewtîtiyên xwişk û birayên xwe, yên li gor min şaş bûn, min lêdaneke weke ya girtîgehê li wan dikir. Kesekî nema diwêribû bi min re qise bikin. Kesên ku bixwestana ji min re tiştê bêjin an qise bikin, diviya bû ku bi awakî nîzamî bi axîfîyana. Ew kesê ku bihata hemberî min û nîzamî nesekiniyana, lêdan dixwarin. Ji bo vê yekê rehetiya malbata min ji destê min nema bû. Ji bona van kiryarên min, wan çend caran li min jî dan. Ez çend rojan girêdam, tu fêde nedîtin. Eynî rewş ji bona kesên gundiyan me jî derbas dibû. Kesê ku bihata ba min û qise bikirana min ji wî re jî digot:

-Kurê min divê tu nîzamî raweste û bi dengê berz qise bike. Bi kurtasî li girtîgehê min çi dikir, ew tişt dixwest li wir, li gundê xwe, di nav malbata xwe de jî bikim. Ji ber vê yekê bû, gelek caran şer di navbera min û gundiyan de derdiket. Min li herkesî dida, dûre gundiyan navê dînbûnê bi dû min xîstin, herkesî digot in:

-Ev reben çû leşkeriyê dîn bû û hat, wax, wax wê çawa be. Loma kesî êdî tîkiliyên xwe bi min nedianîn. Bi min re qise nedikirin. Kesên qise

bikirana jî lêdana xwe ji min dixwarin. Her kesekî ez dîn dizanîbûm. Bi tena xwe mam, weke kesekî dîn û beradayî. Piştî çendakî li xwe hay bûm, lê êdî ev tîgihîştina min pere nekir.

Li vir min nexwest ku ew zêde behsa tiştên malbatî bike, loma min, ji wî pirsî û got:

-De baş em ê dawiyê werin ser van tiştan. Piştî wê xwarina xweş, yuzbaşî çi ji we kir? -Ji xwe ya girîng ev e.. Li wir, yanî li metbexê, piştî xwarin û vexwarinê, yuzbaşî em xîstî rîzê û dest bi axaftinê kir:

“-Binerin hevalno, weke ji we jî diyar e ku di leşkeriyê de tiştê herî zor, dema ecemîtiyê ye. Mirovê ku li ecemîtiyê lêdanê nexwin tune ne. Kesên nobedarî negirin tune ne. Ev tişt dibe qismetê herkesekî ecemîtiyê dikin. Ev çend rojên ku ez di dema talîmê de di derheqa we de bi gelek tiştan hesiyam; bajarê ku hûn jê ne, fêr bûm. Rewşa we û yên malbatên we bi her awayî dinasim. Ji ber vê yekê ye ku min hûn hilibjartin. Eger hûn li min guhdarî bikin, tiştên ku ez dixwazim hûn pêk binin, hûn ê heta talîya temenê xwe bi awayekî şad bijîn. Tiştên ku ez dixwazim ne ji bona şexsê min e. Ji bo hebûna dînê me yê îslamê û welatê me î delal e. Ji bona van herdu tiştan divê mirov karibe her fedekariyê bike. Ji ber ku kesek nikare bê dîn û bê welat bijî. Weke hûn jî dizanin ku di

»»»»Dom R:5

van salên dawîn de gelek kesên komînîst, anarşîst, dînsiz û kurtçî dixwazin welatê me û ew dîne me ê muqedes ji dest me bigrin. Ma hûn dizanin ku komînîst çî dixwazin? Me hemûya bi hev re got:

-Na, komûtanê mîn.
-Baş e, ez vê yekê jî ji we re behs bikim, baş guhê xwe bidim min.

Komînîst ew kesê ku ji bo wî, dê, bav, xwîşk û bira yek e, ferq di nava jin, dayîk û xwîşkê de tune ye. Yanî her kesê komînîst dikare bi diya xwe re, bi xwîşka xwe re razê, ev ne eyb e û ne jî şerm e. Ew kesê anarşîst jî dixwazin hema kuştinê bikin û bêtirîn ew ji kuştina leşker û polîsan hez dikin. Aha hûn di tv yê de dibînin û dibîhîzîn ku roja leşker û polîsên me nayên kuştin tune ye. Ji bilî vana yên herî xeter, bi zerar û tehlûke ne, ew kesên ji wan re dibêjin Kurd. Ew dixwazin vî welatê me perçe

bikin. Bi alîkariya dijminên me yên gawir, bi navê Kurd dixwazin welat perçe bikin, de werin vê ecêbê. Dema ew welat jî perçe bikin, ew kesên li hêla wan bimînin, ew ê hemûyan bikujin û wê wan kesan bi saxî serjê bikin. Ew him anarşîst, him konunîst û him jî kurtçî ne. Ji bona welatê me î xweş û delal, van kesên Kurtçî tehlûkeyên herî mezin in. Ew kesên vî karî dikin, an didin kirin, me gelek ji wan girtine û xîstine girtîgeha Diyarbekirê. Divê ew bêne terbiyekirin. Divê serê wan ji wan fikrên çewt bêne paqîskirin. Divê em bi hev re wan bikin ewladên baş û qenc, ji bo welatê xwe î şêrîn.

Eger hûn rê nedin komînîst, kurtçî û dînsizan, em ê bi hev re welatê xwe ji van mîkroban azad bikin. Eger em bi hev re van kesên weha bi tehlûke bînin rê, hûn ê hemû ji bo vê yekê, ji ber welatperweriyên xwe, diyarî bigirin. Hûn ê bi her awayî di girtîgehê de serbest bin. Xwarin û vexwarinên we, wê ji kîsê dewletê be û xwarina we wê

ya herî xweş û delal be.

Hûn ê bi her awayî serbest bin. Kesekê ne li ser û ne jî li ber we bin. Hûn ê him qomûtanê xwe û him jî yên girtîyan bin. Meziniya vê girtîgehê hûnê bikin. Di berpirsiyariya karê xwe de hûn ê ji min jî mezintir bin. Dema min jî sûc û guneh kir, li min jî bixin. Nobedariya derve wê ji bo we tune be, çî gavê hûn bixwazin hûnê bikaribin, razên, rûnên, bixwin û vexwin. Her yek ji we, wê bibe, komûtanê qawîşeke girtîyan, qawîş wê di emirê we de be, emirê xwe hûnê bi xwe bidin. Kesên li we guhdarî nekin, hûn çî bîne serê wan hûn ê bi xwe biryar bidin û di biryara xwe de hûn ê serbest bin. Tenê ez ê ji we daxwazekê bikim û ew daxwaza min dê ev be ku hûn bi awakî dilsoz wan kesên di vir de, yên bê dîn û îman, kurtçî û anarşîst, xwedê nenasan bînin rê. Kesê ku zû bi ser keve, ez ê hîn zêdetir, mafê îstîrehetê bidim wî. Lê ew kesê ku vê daxwaza min pêk nînin, ew ê vege-re cihê xwe, vege-re jî, wê ne weha rehet be. Di vege-re de

serbazê ji we bipirsîn: "çima hûn bi şûnde vege-re yan" hûn ê nikaribin tu bersîvê bidin. Ji bo ku we karê xwe yên welatparêzî pêk neaniye, li wir him hûn ê lêdanê bixwin û him karê herî zor wê ji bo we bê dayîn. De êdî her tişt wê li gor daxwaz û biryara we bê kirin.

Yuzbaşiyê me axaftina xwe qedand, wî him em tehdîd dikirin û him jî nesîhatên xwe li me dikirin. Ji xwe tiştê ku me bigota tunebû. Hin kes bi zanabûna ku ew ê li komînîst û kurtçiya bixin hatibûn, hin jî weke min ji ber feqîriya xwe û bê peretî û nezaniya xwe hatibûn. Nav û paşnavên me hate lêkirin û tu kesekî ji me tu tişt negot. Navên weha li me kirin ku tu kes me nas neke. Navên me yên rastî nizanibin ku dûre tu tehlûke neyê serê me. Kêfa yuzbaşî li cihê bû, li gor wî her tişt qediya bû. Loma em li erebeyekê siwar kirin û berê me da wê girtîgeha bi nav û deng ya li bajarê Diyarbekirê, ya ji bona kurtçiya hatibû, çêkirin".

Yad û bîra 25`ê Gelawêjê bilind hate nirxandin

Di rûresmeke mezin de, û bi boneya salvegera avakirina Hizba Demokratî Kurdîstanê bi destê "Pêşewa Qazî Mihemed" û hevalên wî, yad û bîra 25`ê Gelawêjê, bilind hate nirxandin.

Pêka nûçeya ku gihîştîye malpera "Kurdîstanmedia"yê, roja Pêncşemî 24`ê Gelawêja 1398`an, li binkeya sereke a PDKÎ yad û bîra avakirina PDKÎ bilind hate nirxandin. Rêûresim bi xwandina marşa netewî a "Ey Reqîb" û ragirtina bîstekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdîstanê dest pê kir.

Piştî rêzdar "Hesen Şerefi" cihgirê yekem ê Lêpsiyarê Giştî ê Partiya Demokratî a Kurdîstana Îranê, peyama PDKÎ bi vê boneyê pêşkêş kir.

Navbirî di peyama xwe de, tevî pîrozbahîya vê rojê li tev xelkê Kurdîstanê ku Partiya

Demokratî wekî hizbeke azadîxwaz nas dikin, ragihand: "Em pîrozbahîya taybet a Partiya Demokratî li kadr, pêşmerge û alîgirên wê hizbê dikin ku erkeke giran a bandordarbûn û bihêzbûnê girtine stûyê xwe".

Herwisa got: "Merema me li "Rasan"ê ku wekî xebata çiya û bajarê tê şirovekirin, eve ye ku xebata me giştî be, û piraniya xelkê Kurdîstanê wê bi ya xwe bizanin". Navbirî di berdwamiyê de got: "Niha givaş li ser rejîma Tehranê çend zêde bin her hinde jî hêvî bo paşerojê bo me yê Kurd û Partiya Demokratî ronahîtir dibe". Piştî "Seyad Mîkayîlnîjad" Pêşmerge Hünermend, ştraneke şoreşvanî bi navê "Mizgîn Ey Şehîd" pêşkêş amadebûyan kir.

Piştî payama Komîteya Hevahengî a Saziyên Demokratî en Kurdîstana Îranê, ji aliyê "Selam Îsma`îlpûr" endamê



Desteya Birêveber a Yekîtiya Xwendkarên Demokratî a Kurdîstana Îranê ve hate xwindin.

Navbirî di peyama xwe de got: "Partiya Demokratî xwediyê gellek taybetmendiyên balkêş e ku pêgeha civakîya vê hizbê bi berfirehiya hemû Kurdîstanê berfireh kiriye, û di kûrahiya dilê hemû xelkê de cihê xwe vekiriye".

Herwisa di peyama wan de îşare bi vê yekê kir ku, "rêbaza Demokratî, hewleke bo vê ku mirovê Kurd li ser bingeha girîngên wekî Demokratî, rizgariya netewî, çareseriya dadperwerane a pirsên tebeqeyî, sêkolarîzîm û yeksaniya regezî, bê perwerdekirin, û ji rêya rêkxistina şoreşvanî ve xebata xwe di wan derheqan de armancdar û kanalîze bike".

Di pareke din a rûresmê de, "Kamiran Serşîn" Pêşmerge Hünermend, ştraneke bi navê "Tirîfeya Mangeşew" pêşkêş kir.

Di parek din a rûresmê de, girûpa sirûd a "Newiyên Qasimlo" a ser bi Navenda Nêrgîzê, sirûdek bi navê "Demokratî Hêviya Bilind a Welat" pêşkêş kir.

Ev rûresme bi dîlankirina amadebûyîyan dawî pê hat.

Nerîna Lîderan



Mîstefa Hicrî:

“PDKÎ, ji xelkê pêk hatiye û partiya xelkê ye”.



Mike Pompeo:

“Demjimêr bo Îranê dawî pê tê”.



Benjamin Netanyahu:

“Li her cihekê ku hewce be emê li dijî Îranê çalakîyên xwe bikin”.



“Xaminyî”:

“Pirsgirêkên bingehî ên xelkê Îranê ev in ku Xwedê nahebîn in”.

Cejna Qurbanê jî di navbera Îran û Erebiştanê de hevrikî bû



N: Eskender Ce'iferî

Erebiştan û Îran, her sal Remezana xwe jî cuda destpê dikin û cuda jî cejnê digirin. Cejna Qurbanê jî li cem wan bi heman rengî ye. Lê sala 2017an Erebiştan, Îran û Tirkiyê ku sê hêzên bi bandor li navçeyê ne, Remezana destpê kirin. Êdî ol li cem wan tam bûye siyasî. Sala 2017an dihate gotin ku belkî rejîma Îranê bixwaze bi vî rengî, car din xwe nêzîkî Tirkiyê û Erebiştanê bike. Lê 2018 û 2019an berovajî vê derket holê.

Her sal bi dehan kesan li Îranê ji ber pêwendiya wan bi aliyên dijberên Îranê ên Sunne re di meha Remezane yan jî di cejna Qurbanê de tene girtin. Sala 2017an ku Îranê metirsiyên derdorê, berfirehtir diditin, cejn bi Erebiştanê re ragihand û di encamê de kesek nehate girtin. Ji aliyekî ve Donald Tramp û şayê Erebiştanê û ji alî din ve tevgerên hêzên Amerîkayê li Kendavê, hemû bûne sedem da ku Îran heşt bi nîgeraniyê zêde bike û dest bi çêkirina pêwendiyên bi Erebiştanê re bike. Lê belê Erebiştanê beriya wan, çirayê kes nîşanî Amerîkayê da û lewre jê 2018 û 2019an, careke din cejn, bû sedema hevrikiyan.

Mihemed Edîbî çalakvanê Kurd yê Rojhilatê Kurdistanê dibêje: Tevî ku hevrikî di navbera her du aliyan de heye jî, lê gel tenê bixwe dikare tiştekê bike. Ez matmayî me gelo Xwedê wan hemû girtiyên siyasî nabîne ku dehan sal in li Îranê di girtîgehê de ne lê meha Remezane û hejaran dibîne! Divê gel bi destê vala jî be, serî hilde.

Mensûr Reşîdzade rojnamevanê navxwe ji Îlamê di vî baweriyê de ye ku hevrikiya Îran û Erebiştanê



di Remezana 2017an de tenê taktîka Komara Îslamî û tekezê dike ji bo ku siyasetên wan li ba me zelaltir bibin, em dikarin serî li rewşa Îraq, Sûriyê û Yemenê bidin û şerê wan yê bi nûneratî bibînin. Di 2019an de jî hevdem ku ew şerê bi wekalet, gurrtir bibû, careke din cejnên xwe ên Remezana û Qurbanê, cuda ji hev girtin.

Rojnamevanên nêzîkî rejîma Îranê di vî baweriyê de ne ku Erebiştan piştevaniyê pêşkêşî dijberên Îranê dike bi merca ku alozî û tevliheviyan di nav axa Îranê de çê bikin. Kemal Teqîzade nûçegihanê ajanseke hikûmetê li Tehranê got ku eger Îran aram bimîne, xewna aram a Erebiştanê tevlihev dibe ji ber ku ew, wan du dewletan bi sûndxwariyên li hemberî hev binav dike û dibêje eger Erebiştan şer nekşîne nav Îranê, agirê şerê Îraq û Sûriyê, wê wî welatî jî li xwe bigire. Ew tekezê dike ku hemû ev gotin, bi rengekî neraşterast ji gotarên berpirsên her du aliyan li hemberî hev xuya dibin.

Li ser vî riftara rejîma Îranê bi Erebiştanê re çalakvanên komonîst bi rengekî din difikirin. Amanc Kemalîzade ku çend salan beriya niha li ser çalakîyên xwe raştî lêpîrsîne jî hatibû dibêje eger rejîma Îran biryarê bide li siyaseta xwe vegere, divê dev ji Sûriyê, Îraq, Lubnan û Yememê berde. Bi vî kiryarê

jî êdî armanca wan a avakirina heyva şîe nagihê encamê. Kemalîzade amaje jî dike ku take sedema nêzîkiya rejîma meleyên Cemarane li Erebiştan û Tirkiyê ev e ku bikare meyla wan du hêzên mezin, ji bo tevgerê li dijî partiyên Kurdî zêde bike.

Ev di demekê de ye ku du salan beriya niha ku hîn pêwendiyên di navbera rejîma Tehranê bi Riyazê re tam qut nebûn, Esadolah Esxeroladî cîgirê rêveberê Encumena hevpar aa bazirganiya her du welatan ragihand ku Îran û Erebiştan dikarin pêwendiyên bazirganî ên dualî vejînin û Erebiştan di warê bazirganiyê de sêyemîn hevparê Îranê ye.

Hin siyasetvanên din ên Îranî jî weke Mihemed Xatemi û Mîrhusên Mûsewî weke wî difikirin û radigihînin ku Îran dikare xwe li Erebiştanê û Tirkiyê nêzîk bike da ku bandora Îsrailê û Amerîkayê li navçeya Kendavê bi taybetî û li Rojhilata Navîn bi giştî kêmbike. Ji ber ku eger Erebiştan ji wan re erê neke, ew nikarin hêzên xwe li welatên Erebi bîcî bikin. Ew dibêjin bijardeya herî nêzîk li pêşiya wan şerê aborî ye. Kî bikare hevparên xwe zêdetir bike, ew serdikeve. Bi her hal Remezana û Qurbanê îsal jî derbas bûn û car din xuya bû ku dijatiya wan du deşhilatdaran raşt e û nayê înkarkirin.

Fermana 28`ê Gelawêjê nekarî Kurdan tune bike



N:Nûredîn Sofizade

Di 28`ê gelawêja 1358`an de, Xumêynî Fermana Cîhada qirkieina Kurd bi dijî gelê Kurd li Rojhilata Kurdiştanê da, li ser esasê wê fermana dijî mirovane, êrîş bi hemû awayekê bo ser Kurd û Kurdiştanê deşt pê kir.

Hêzên cehl û nezaniyê êrîş kirin û pêka wê fitwaya Xuminîyê dijî mirov, wan can û mal û namûsa Kurdan bi helal zanîn û deşt ji tu cure cinayetekê neparastin, ew kuştin, talan kirin, şevitandin û rehim bi Zarûkan re jî nedikirin.

Xumêynî û komek Melayên derfet pereşt ku ji hesta Olî ên xelkê Îranê mifah vergirtin û siwarê pêla bi çoşe şoreşa xelkê Îranê bibûn, kite rêka sepandina deshîlata reş û paşweroye xwe, kuştin û riandina xwîna xelkê Îranê, bi baştirîn rêke bo xwe dizanîn. Lewma bona çavtirsandina xelkê cudabîr û azadîxwaze Îranê, bona mat kirina hemû dengeke demokrasîxwaziyê, bona tesviye kirin û betal kirina Part û Hizbên Çep û Demokrat û sikolar, bona temirandina dengê mafxwazî ya Netewên jêrdeşt û bêmafe pêkînerên Îranê, deşt ji encam dana ti cinayetekê neparasin.

Xumêynî û davdeştîkên wî, her roja deştîpêka hatina ser kar netewa Kurd cehd kir ku ji rêka aşti û danûstandinê ve, pirsra mafê Kurd digel Axundan çareser bike û di vê derheqê de gelek pêngav ji aliyê Hizba Demokrat û Heye`eta Nûneratiya gelê Kurd ve hatine avêtin, lê mixabin hemû bê encam bû û Xumêynî cehd kir her wekî cihên din ê Îranê û hewşeweya tepeser kirina netewên din, Kurdan û dengê mafxwaziyê wan ji rêka êrîş, kuştin, agir û asin mat bike.



Lewma Xumêynî di fermaneke dijî mirovayî de, roja 28`ê Gelawêja 1358`an, netewa kurd bi kafir da zanîn û bi merema ji nav birin û mat kirina dengê Şoreşa Kurd, deştûra êrîşa bo ser Kurdiştanê û gelê Kurd, da hêzên cinayetkar ên xwe. Wê Fermana Xumêynî bi dijî Gelê Kurd, bo hêzên cehl û nezaniyê re 2 rewayî hebûn.

- 1- Xumêynî bi Rêberê Şoreşa Îranê bi dijî Rejîma Paşayetî dizanîn.
- 2- Xumêynî ji warê Olî ve jî bi Merce`ê Teqlîd ê xwe dizanîn.

Lewma wan Hêzên ku bi Fermana Xumêynî êrîşî ser Kurdiştanê dikirin, wisa dizanîn ku can, mal û namûsa Kurdan helale û dibe bêne Kurdiştan û hekî ji wir jî bêne Kuştin, ewa bi bê ravesandîna dê biçine Biheştê. Partiyên Şoreşvan ên Kurdiştanê û yek ji wan PDKÎ û Gelê Kurd di helwêsteke dîrokî de, biryara berxwedan û ferewanî ji man û mewcûdiyeta xwe dan.

Ew êrîşa hovane a rejîmê, û di hember de berevaniya Xelkê Kurdiştanê, 3 Mehan dom kir, Raşte gelek xisarên Malî û canî giha Gelê me, hezaran kesên bê soç û sîvil Şehîd bûn, Gund û bajar wêran bûn, lê di hember de dehan hezar hêzên cinayetkar di kurdiştanê de hatine kuştin, hezaran maşîn û alavên giran ên şer ên rejîmê hatine herfin, sedan Tang û Zirihî, hatine têkşikandin, dehan firoke hatine xistin, û ew Fermana Xumeyniyê cinayetkar û êrîşa bo ser Kurd û Kurdiştanê raştî şikesteke

mezin hat û ne tenê wê êrîş û cinayetê nekarî dengê şoreşa Kurd wekî cihên din ên Îranê mat bike, belkî di Kurdiştanê de wanyên ji bîr neçûyî dane rejîma Xumêynî.

Berxwedan û berevaniya Kurd di Rojhilata Kurdiştanê gelek ceribandî bi deşt xistin, gelê me ji îrada Neteweyiye xwe xwedî derkevt, bi hegera wê berxwedanê gelê me da kîvşê ku teslîm nebe. Bal Gelê me ew şer û berxwedaniya, bi şerê 3 mehe hatiye naskirin. Piştî şikesta mezin a rejîmê û hasil nebûna xweziya Xumêynî, di roja 26`ê meha Xezelwera heman Salê de, Xumêynî bi meqseda xapandina bîrûraya giştî û êtiraf nekirina bi şikesta xwe, di peyamekê de ragihand: Bila şer ragirin û dujminên Îranê û Îslamê em xirab ji mesela Kurdan têgehandibûn û li cihê şer, bona çareseriyê wê pirsê em dikarin rêka aştiyane û civînê bigrine bera xwe.

Di raştî de pîlana weşartî û piştî perde a Xumêynî, ne aşti bû û ne gotûbêj û ne çareseriyê pirsra Kurd, belkî xapandina gelê Kurd bû, ew pîlanên weşartiye Xumêynî jî ewane bûn.

- 1- Teswiye û yek deşt kirina hêzê Artêşê, li ber ewê ku Artêş hemen Artêşa serdemê hikûmeta sernixûn bûyî ya Paşayetî bû, gelik bi keyfa Xumêynî emel nedikir, her roja piştî peyama ragirtina şer, rojane sedan pile-darê Artêşê li ser Xiyewanan Êdam dikirin da ku hem xel çavtirsandî bin û hem Pile-

darên din ên Artêşê Bey`etê digel Xumêynî bikin.

2- Xumêynî ku dilê wî gelek bi Artêşê gerim nebû, kewte fikra çêkirina hêzeke din a çekrar ku parêzerê derbeşte Rejîmê be, ewa bû ku deşt bi cî Sipaha Pasdaran û hêza Besîc damezrand.

3- Xumêynî û karbideştên wî hatibûne ser wê baverê ku bi bê naskirina cografiya, rêke, hilkewta gund, bajaran û bê venasîn, lez kirine ku êrîşî ser Kurdiştanê kirine, û sebebê para zafê şikesta xwe jî, nebelediya hêzên xwe di Kurdiştanê de dizanin. Ewa bû ku sedan kirêgirtî û sîxurên xwe li berg û navên curbicur de xistine nava Kurdiştan bo şunasayiyê.

4- Dema ku Xumêynî fermana bi dijî Xelkê Kurdiştanê da, werzê germayê û hawîn bû, bi hegera ewê ku Kurdiştan ciheke Çiyayîye û werzê Sir û seqemê zû tê, lewma dizanîn ku êdî hêzên wî dê zêdetir telef bibin, fikr ji wê hindê kir ku heta zivîstan derbas dibe û ew bi amadekariya zêdetir dem teyar bikin bo Şer.

Gelek nekêşa ew pîlanên weşartî ên Xumêynî hemû eşkerebûn, ji Newroza sala 1359`an ve we dîsan êrîş û cinayetên rejîmê bo ser gelê me deştîpêkir.

Belê ew sebebane bûn ku Xumêynî neçar kirin da ku roja 26`ê Xezelwerê peyama ragirtina Şer bide, hekîne Xumêynî heta mir jî ew peyama xwe betal nekir, Deştîlatdarê piştî wî jî ew peyama betal nekirin û ewa di heyama 40 salane ku ew şera bi awayên curbicur bi dijî Gelê me berdewame.

Yadê Şehîdên Kurdiştanê hertim zindî be, û berxwedanî û hemaseya gelê me hertim cihê şanaziyê ye. Êrîş û cinayet û tu fermanek nekariye û nikare gelê me bêxe qedeman û teslîm bike, naha jî dengê mafxwaziyê Kurd û îrada berxwedaniya wan ji hemû demê derbas-bûyî zêdetire.

Welatîyên Kurd dibine qurbaniya pizîşkan

Welatîyekî Kurd ê xelkê devera Kotul bi sedema şaş lêdana derzî ji aliyê Pizîşkan ve, canê xwe ji dest da.

Welatîyekî Kurd ê bi navê “Mihemed Elîgî lo” ê xelkê devera Kotul a ser bi bajarê Xoye, bi sedema şaş lêdana derzî ji aliyê pizîşkê nexweşxaneyê Xuminî a bajarê Urmîyê ve, canê xwe ji dest da.

“Mihemed Elîgî lo” xelkê devera Kotu bû û eve çend sal bû ku di bajarokê Îslam Abada Bajarê Urmîyê de ji-

yan dikir, û nexweşiya gurçik hebû û bo tedawiya pizîşkî di nexweşxaneyê Xuminî a bajarê Urmîyê de hatibû razandin.

Navbirî bi sedema derzî lêdana şaş ji aliyê pizîşkê nexweşxanê ve, raştî nesaxiya mêjî hat û canê xwe ji dest da, û malbata navbirî bi wê sedemê şikayeta duktorên nexweşxaneyê Xuminî kiribûn, lê berpîrsên rejîmê bersiva wan nedane.

Her di vê pêwendiyê de, roja Duşemî 14`ê Gelawêjê, Mihemed Îbrahîmî, temen 5



salî, bi sedema şaş lêdana derzî ji aliyê pizîşkê nexweşxaneyê bajarê Mehabadê ve, canê xwe ji dest da.

Di heyama çend mehên derbasbûyî de çendîn kes bi sedema şaşitiya pizîşkan bûne qurbanî, û berpîrsên rejîmê jî wê pîrsîrêkê çareser nakin.

Welatîyekî bajarê Urmîyê dawî bi jiyana xwe anî



Welatîyekî Kurd ê xelkê bajarê Urmîyê bi sedema arîşeyên civakî dawî bi jiyana xwe anî.

Pêka nûçeya ku gihîştîye malpera “Kurdiştanmedia”yê, roja Duşemî 28`ê Gelawêjê, welatîyekî Kurd ê bi navê

“Nuredîn Mikailî” kurê Fexredîn, bi sedema pîrsîrêkên civakî destavête bi xwe kujiyî.

Ew welatîyê Kurd xelkê gundê golegenî a girêdayî devera Soma a ser bi bajarê Urmîyê ye, û bi sedema pîrsîrêkên civakî dawî bi jiyana xwe anî.

Piraniya welatîyên Kurd di Rojhilatê Kurdiştanê de, bi sedema bêkarî, bêhêvîbûn li jiyana, hejarî û...hwd, dawiyê bi jiyana xwe tînin.

Hêzên rejîmê kasibkarekî Kurd kuştin

Kasibkarekî Kurd ê xelkê bajarê Selmasê bi sedema gulereşandina raşteras a hêzên Spaha Pasdaran a terorîst li ser sînorê Kêkeşînê canê xwe ji dest da.

Pêka nûçeya ku gihîştîye malpera “Kurdiştanmedia”yê, Roja Sêşemî 29`ê Gelawêjê, kasibkarekî Kurd ê bi navê “Mihemed Hemîzade” ê temen 30 salî û kurê Yunis û xelkê Gundê Matexirpe a ser bi Bajarê Selmasê, raştî gulereşandina raşteraste a hêzên Spaha Pasdaran a ter-



orîst hate û canê xwe ji dest da.

Ew kasibkarê Kurd bi bê agehdar kirina berê li ser sînorê

Kêleşîn a girêdayî bajarê Şinoyê, ji aliyê hizên Spaha pasdaran a terorîst ve raştî gulereşandina raşterast hatîye û canê xwe ji dest da.

Mihemed Hemîzade ê temen 30 salî, bona peyda kirina pariyeke nan bo malbata xwe ji Selmasê ve, rêka herêma Şinoyê girtibû ber xwe.

Kêm roj heye ku kasibkarên belengaz ên Kurd bi hegera dujminkariya rejîmê, nekevne ber gullan û neyêne kuştin.

Kasibkarekî Kurd hate kuştin

Kasibkarekî Kurd ê xelkê bajarê “Şinoyê” bi sedema teqeya raşterast a hêzên Spaha Pasdaran hate kuştin.

Li gori rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, êvareya roja Yekşemî 20`ê Gelawêjê, kasibkarekî Kurd ê bi navê “Se`îd



Hesenpûr” temen 44 salî, ê gundê “Kanîreş” a ser bi bajarê “Şinoyê” kete ber teqeyên raşterast ên hêzên Spaha Pasdaran û canê xwe ji dest da.

Ew kasibkarê Kurd bi bê agehdarkirin berê kete ber teqeyên hêzên Spaha Pasdaran.

Hêzên Spaha Pasdaran ew kasibkarê Kurd bi sedema veguhas-tina kelûpelên qaçax, kirine armancê teqeyê xwe.

Bêhrûz Boçanî bû xwediye xelata neteweyî a “Jiyanname” a welatê Ustraliyayê

Nivîser û rojnamenivîsekî Kurd ê xelkê bajarê Îlamê, bû xwediye xelateke din a wêjeyî.

“Bêhrûz Boçanî” rojname-nivîsê Kurd ê xelkê bajarê Îlamê ku di dorgeya “Manos” a welatê Ustraliyayê de dijî, xelata neteweyî a “jiyanname” a welatê Ustraliyayê bi deşt xîst.

Ew xelata 17 Hezar dolarî ye, bona çîroka “Tu hevalek bilî çiya” bi wî rojnamenivîsê Kurd re dan.

Çîroka “Tu heval bilî çiya” berhema “Bêhrûz Boçanî” ye, heya niha bûye xwediye çendîn xelatên wêjeyî, bi taybet xelata Vikturiya bo wêje û xelata Vikturiya bo ber-

hema neçîrokî bi deşt anîye, Boçanî li dorgeha Manos de ye û dewleta Ustraliyayê derefeta derketin ji dorgehê pê re nade.

Sala 1396`an, wî rojnamenivîsê Kurd, dîkomentariyek bi navê “Çoka” rewşa jiyana penaberan di kempên “Manos û Naro” de, daye ber çavan.

Ew dîkomentêre ku bi kamêraya mobaylê hatibû hilgirtin, di fişîvala Lendenê de bi 3 zimanê Kurdî, Farsî û Îngilîsî hatibû nîşandan.

Bêhrûz Boçanî, xelkê parêzgeha Îlam, nivîskar û rojnamenivîsê Kurde ku bi hinek sebebên bi neçarî ji Îranê derketiye û di wê heyamê de hatubû deştêserkirin



û di dorgeha Manos a Ustraliyayê de, deşt bi dîkoment kirina pirsgirêkên nava kempên “Manos û Naro” de û çalakî di ser mafê mirovî kiriye.

Keyhan Kelhûr xelata “Womekisê” bi deşt xîst

Keyhan Kelhûr” muzîksaz û Khûnermendê Kurdê, xelata (womex) di asata cîhanê de bi deşt xîst.

Pêka nûçeyên belavbûyî, Nozdemîn xelata cîhanî a muzîk a bi navê “Womekis” (Womex) bi “keyhan Kelhûr” muzîksaz û hûnermend, û zenyarê kemançe û sêtar ê Kurdê û xelkê bajarê Kêrmaşanê re hate dan.

Ew xelate li roja 5`ê Xezelwera 1398`an (27`ê Çiriya

Pêşîn a 2019`an), hevdem di merasima 25`emîn salroja avabûna “Womekis” (Womex) li welatê Finlandê de bi “Keyhan Kelhûr” re tê dan.

Xelata “Womekis” ku wekîm xelata cîhanî a “Êkspo” hatiye naskirin, di sala 1999`an de hatiye avakirin, ew xelate bo rêzgirtin li kesên yekim ê muzîka cîhanê di asta navneteweyî de û girîngî dan bi muzîk, her sal di 5`ê Xezelwerê (27`ê Çiriya Pêşîn) de, û hevdem digel



salroja avabûna “Womekisê”, xelate bi kesekê re ku şiyana wê xelatê ye tê dan.

“Keyhan Kelhûr” muzîksaz û hûnermend û zenyarê kemançe, Sêtar û tenbûr, ê Kurdê ê xelkê bajarê Kêrmaşanê ye.

Rejîmê pêşî ji birêvebirina Konserta girûpa Nûdemê girt

Rejîma Îslamî a Îranê pêşî li bi rê ve birina Konserta girûpa muzîkê ya Kurdî ya bi navê Koma Nûdemê di bajarê Selmasê de girt.

Girûpa muzîkî ya koma Nûdem di heyama çend rojên derbasbûyî de amadekariyên xwe kiribûn ku konserteke muzîkî li bajarê Selmasê lidar bixîne, lê duh ku çend demjimêr mabûn bo konsertê, rejîma Îslamî pêşî lidar xîstina konsertê girt û nehêla bi rê ve biçe.

Girûpa muzîkê ya Nûdem li ser rûpela xwe ya Înste-

gramê belavkiriye, ji ber ku jin amûrên muzîkê lê dixin û rejîmê bi vê sedemê pêşî ji konserta wan girt, û ji wan xweştine li cihê wan Jinan Mêran dabinin, û jibo wê Konserta wan bi rê ve naçû.

Ev yekemîn car bû ku îzin dadûn girûpeke muzîkê ya Kurdî di bajarê Selmasê de konsertê bi rê ve bibin û wezareta Ferheng û Îrşad a wî bajarî konserta wî girûpa Kurdî hilweşandiye. Koma Nûdem ew çend heftebûn li ser hesabê xwe tirakit belavkiribûn û reklama kon-



serta xwe kiribûn.

rejîmê di demekê de ew kiryare encamda ku, ew girûpe û hezaran girûpên din ên muzîkî di bajarê Urmîyê û di seranserê Îranê de, mifah li jinyarên keç vergirtine.

Zimanê Kurdî

Wek : - Evde (ev der) kû ye ? - Evde welatê me ye .

- Evde ji her derê xweştir e .

Diyar e ku (evde) jî, bi wateya cihekî nêzîk bikar tê .

13- Wêde : Bêjeya (wêde) jî, bêjeyeke lêkdayî ye, ji cînavê nîşandan (wê) û gotina (derê) pêk hatiye : - Kîta (rê) ji gotina (derê) hatiye avêtin : - Wê de ... = wê de - Cînavê (wê) û (de) ya (derê) hatine pevxistin: - Wê + de = wêde . Ev bêjeya sivikbûyî û pevxistî (wêde), bi wateya cihekî dûr tê xebitandin . Wek :

- Tû li wêde (wê derê) çi dikî ?

- Ez li wêde nêçîrê dikim . - Nêçîra wêde xweş û hêsan e .

14- Ewde : Ev gotin jî lêkdayî ye, Bi şeweyekî gelêrî, ji cînavê nîşandan (ew) û peyva (der) hatiye sivikirin û pevxistin : - Tîpa (r) ji peyva (der) hatiye avêtin : - Ew de ... = Ew de - Cînavê nîşandan (ew) û (de) ya (der) hatine

pevxistin:

- Ew + de = Ewde Bêjeya (evde) bi wateya cihekî dûr tê xebitandin.

Têbînî :

Di zimanê kurdî (kurmanciya jorîn)de ev her çar peyv “îroj, îşev, îsal, îcar” bi pirranî tîpî xebitandin. Gelo ev (î) ya destpêka wan peyvên çî ye ? Bi dîtina min, (î) di reseniya xwe de cînavê nîşandan e. Ev cînavê nîşandan (î) bi şeweyekî gelêrî ji (îv,în) sivik bûye û bi ser van her çar bêjeyan ve hatiye berdan “roj, şev, sal, car” . Wek :

- Em ê îroj herin seyrangehê

- Îşev hîvron e .

- Sala îsal xêr û bêr e.

- Divê îcar em li hev rûnin .

Cînavê (îv), yê ku (î) jê kurtebirr bûye li Kurdiştana rojhilat, Mehabad û hindê herêmên dîtir bikar tê : - Îvroj welat xweş bûye . Li hin herêman jî ev (v) ya (îv) bûye (m), wek (îm roj). Di zimanê Farisî de, jî (în) li şûna (îv) bikar tê .

Alavên Nîşandan :

Alavên nîşandan ew bêje ne, yê ku têgeha nîşandan û destnîşankirinê bi xwe ve digrin, bêyî ku cihê navekî bigrin, yan jî wateya cihekî bidin. Alavên nîşandanê ev in : (va, wa). Ev alav ji cînavên nîşandan (ev, ew) û raweyên wan ên verês. hatine dariştin.

1- Va :

Ev alava nîşandanê bo destnîşankirina navên berçav û nêz, bikar tê .

Wek :

- Va Azad nameyê dinivîse .

- Va Şîrîn jî li vir e . - Va pale karê xwe dikin .

Di van mînakên de em bi alava (va)yê guhdarên xwe agadar dikin bo destnîşankirina rewş û heyîna navên (Azad, şîrîn, pale) . Helbet, dema em dibêjin, (va) alava nîşandanê ye (ne cînav e), tê wê têgehê ku em dikarin (va) yê ji hevokan bavêjin, bêyî ku çî kêmasî bighêje wateyên wan ên sereke.

Wek :

- Va Seydayê me li vir e .

(...Seydayê me li vir e) - Va Azad waneyê şirove dike . (...Azad waneyê şirove dike) - Pale, va li vir kar dikin . (Pale..li vir kar dikin).

Lê ku ev (va) cînav bûya, me nikarîbû ew bavêta, çîku cînav cihekî sereke di rêxistina hevokê de digre . Wek :

- Ev kî ye ?

- Tu viya nas dikî ?

Berçav e ku ev her dû cînavên nîşandan (ev, viya) nayên avêtin, çîku hevok bêyî wan cînavan, nema dimînin hevokine watedar .

Wek :

-Kî ye ?

- Tu ...nas dikî ?

2- Wa : Alava nîşandanê (wa) bo destnîşankirina navên

Dûr bikar tê .

Wek :

- Wa baran li ser Cûdî dibare

Dom heye...

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdiistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (356)

Wêneyên rêûresma bidawîhatina dewreya 237 a destpêkî ya pêşmergên PDKÎ

